

Helbestvanê Kurd ê navdar BÊBUHAR

Koça dawîn bar kir



Berbanga roja
Pêncşembê 15.01.2009
an, dilê helbestvanê
Kurd ê navdar û naskirî
Yûsif Berazî-
(Bêbuhar), piştî
berxwedan û kêferat a

derdora salekê bi nexweşiyê re rawestiya.

Bêbuhar ê helbestvan û mûzîk hez, xwediyê dilê mezin û hestê nazik, ji biçûkaniya xwe ve, bi şîrê dayika xwe re, ji cama çavsorî û zordestiya tîrş û tal bi gelê xwe re vexwariye, Paşê bi wêrekî û mêrxasî wî li dijî sitemkariyê serî hildaye û li gora karîn, zanebûn û baweriyên xwe, bervanî di ber doza gelê xwe ya dadmend û rawa de kiriye, berevanî di ber zimên, tore û zargotina kurdî de kiriye, helbestên xweş û şêrîn ji gelê xwe re afirandine û doza gel li nik wî bûye kul û derdê herî mezin û sereke. Ya ku ji ber wê, gelek caran li zindanan bûye mêvan. Ji ber sitemkariya sedê salan, ku li gelê Kurd li seranserî Kurdistanê bûye, belengazî, xizanî û perîşaniyê konê xwe hawîr vegirtine, Girtin, kuştin û wêrankirin li her çar kenaran belav bûye, Buhara welêt hişk bûye, loma wî navê Bêbuhar li xwe kiriye. Lê, rojekê jî ew bê hêvî ne bûye û ta roja dawiyê ji temenê xwe, xebata xwe ya rewşenbîrî berdewam kiriye, evîna gel û ziman di dilê wî de mestir bûye. Tevî hemî astengên jiyanê, helbestvanê me yê mezin serî ji xizaniyê re ne çimandiyê. Her ew bi doza gelê xwe re girêdayî, rastgo û xwedî bîrbawerî ma ye. Wî di dîwana xwe ya 5an de, ya ku li sala 2007an ji bal dezgeha Sema Kurd ya Çand û Hunerê ve hatiye weşandin, Gotiye:

Çiqas sax bim li dunyayê,

Ji dunyayê ezê rabim.

Herim gorê bi dilpakî,
Li dunya nav nexwenda bim.
Wekî pêxemberê Yezdan
Bi herdunya ezê şa bim.
Riya xwar ez ku wê bigrim,
Herim têra û wenda bim.
Ku xwar navê mi derket ew,
Ketim îdî xelas nabim.
Ku erzan bim li nav xelkê,
Bi dunyayê qe şa nabim.
Ku ez bimrim bi rû reşî,
Ji vir tişkî bi xwer nabim.
Bila bimrim ne sax bim ez,
Li nav xelkê ku erzan bim!!

Axa te xweş be seydayê **Bêbuhar** û cihê te buhuştê rengîn be, serê gelê me, malbata we û toreya kurdî sax be!

15.01.2009

Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê

Heval Şiyar çû ser dilovaniya xwe

Ji encama rewşa aborî ya herî dijwar û hikariya wê li ser civakê, pir caran mirov û bi taybetî nişên nû, rê li pêş wendadibin û matmayî dimînin, û ew dibe sedema nexwaşiyên. Di bin sîpera vê rewşa xerap de, di 23-02-2009 an de, heval Şiyar kurê Mihemed Elî, ji gundê Çê, herêma Kurdaxê, di bûyereke xwekuştinê de, jiyana xwe wenda dike. Bi beşdariya xwedî, berketî û hevalên partiya wî, di goristana gund de binax dibe. Bi navê komîta rêvebir ya Newrozê û xwendevanên wê, em serê xwedî û hemî hevalan sax dikin



8ê Avdarê Li Hemî Jinên Cîhanê Û

Bi taybetî Li Jina Kurd Pîroz Be .